


BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD



PIRSA KURDISTANÊ
DÎSA DI PARLAMENTOYA
SWÊD DE...

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD

NAVEROK

21' ê Adarê, Newroz û roja navnetewî ya lî dîjî nijadperestiyê.....	3
Xebata Federasyonê û Xebata Komelan.....	5
Swêd û Mafên Multectiyân... Magna Servitus est Magna Fortuna.....	10
Partiya Komunist dîxwaze pîrsa Kurdistanê bibe Koma Netewan.....	12
Kurtenivisarek lî ser zmanê kurdi yê nivisandî.....	14
Dengbêjên rizgariya Filistin.....	16
Têkiliya zaravayan.....	17
Helbest.....	19
Kurd û Kurdistan, bî çavên biyanîyan.....	20
Xaçerêz.....	22
Mendalê Mamoste.....	23

○

Berpîrsiyar
A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan
A. M. GILLY

Raxistina Nivisaran
SEYRAN û GULBAHAR

Redaksiyon
KEYXUSRO SÛPAN-MAHMÛD
LEWENDÎ-BENGIN BOTANI
ŞORIŞGER ESKERÎ-ROZA SEYRAN

○

B E R B A N G

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet—Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Riza Alan—Layout: A. M. Gilly—Sättning: Seyran och Gulbahar.

ADDRESS

*Kurdiska Riksförbundet,
Tunnelgatan. 14, 3 tr.
111 37 Stockholm/SWEDEN
TEL : 08/ 11 23 42*

*Prenumeration: Medlemmar
50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.
Postgiro: 64 38 80—8*

Xwendevanên Hêja

Va ye cejna me ya netewî, roja têkoşin û raperina lî dîjî zordari û kedxwiriye, newroza hezar salan disa hat. Bila bî xêr û xweşî were. Bila newroza 1983' yan lî gelê me yê bîndest, lî girtiyên me, lî pêşmerge n me û lî we xwendevanên hêja pîroz be !

Xwendevanên Berêz,

Berbanga ku di destên we de ye, beri newrozê hatîye çapkîrîn. Nûçe û nivisarên me yê nî ser newrozê dê di hejmara 9' an de bîn weşandin. Di newroza 1983' yan de, Berbang bî redaksiyoneke nu dest bî weşanê dîke. Em hêvidar in, bî damezrandina redaksiyona nû ve Berbang dê jîyana xwe ya weşani bî awayeki hin dewlemen-tîr û hêjatîr bîdomine û jî aliyê zîman û naveroka nivisarên xwe ve bîghîje sewiyeke bilîntîr.

Rexnên brayên me yê nî Soran jî Berbangê re dom dîkîn. Me di hejmara bûri de jî nivisandîbû; bî bawerîya me dîvê Soranî jî wek Kurmancî bî tipên Latîni bî nivisandî. Ev yek, hem jî aliyê lîhev-nêzbûn û yekîtiya zaravayên me ve, hem jî jî aliyê fêrbûna xwen-dî nî nivisandîna zîmanê Kurdi ve pêwîst e. Eger em dîxwazî ber bî yekîtiya zîmaneki netewî ve hî nî gavan bavêjî n, dîvê em jî nîha ve hazîrîya xwe bîkî n.

Me di vê hejmarê de çend rûpelan jî da xebatên Komelan. Rûpe-lên Berbangê jî bo xebatên komelan her gav vekîrî ne. Komelên ku dîxwazî xebatên wan bî nî weşandin, dîvê nûçe û fotoyên xwe bî xwe amade bîkî n.

Partiya Komunist a Swêd (VPK) vî carê bî imza serokê partiyê û bî navê partiyê pêşniyarnameyek da parlamentoya Swêd. Ev pêşniyarname dîxwaze ku hukumeta Swêd doza Kurdistanê pêş-kêşî Koma Netewan bîke. Kurdiya wê di rûpelên navîn de ye.

Bî Hêviya Ku Em dê Rojê Newrozê Lî Welatê Xwe û Bî Serbestî Pîroz Bîkî n;

Lî Gel Slav û Hurmetên Me
BERBANG

Têbî nî : Nivisarên ku jî Berbangê re tî n bî paş ve nayên vege-randî n.

BERBANG

Kovara Kurdi, Xwedi : Fede-rasyona Komelên Kurdistanê lî Swêd. Buha : 5 Kron, Abo-na salekê: 50 Kron, 30 DM.

NAVNIŞAN

*Berbang, Tunnelgatan 14,3 tr.
111 37 Stockholm/ Sweden.
Tel : 08 / 11 23 42
Postgiro : 64 38 80—8*

Bi avê
 Bi nan
 Bi serî hildana Roja mefermend di serê Sîpan
 Û bi karîna me
 Ew ê
 Bi zarî
 Û bi nemana qidûm di çokan
 Serî deynin.
 Ji Dehak
 Ji çar
 Ji şah
 Rebentir bin.
 (...)

Rojen BARNAS

NEWROZ İSYAN E, XWENÛKIRIN E.

A. Rıza Alan

Newroz, sersala gelê me, cejna me ya kevnare, roja raperina xebatkaran li diji zordari û kedxwuriyê, sembola liberxwedan û azadiya me, va ye disa hat. Gelê me wek her sal dê isal ji cejna xwe ya netewî piroz bike. Welatparêzên Kurdistanê, hin li ser axa rîzgarkirî, hin di eniya çekdar de, hin li gund û bajarên welatê xwe veşari û hin ji li "welatê xeriyê" dê isal ji newrozê piroz bikin.

Em bo çî newrozê piroz dikin; an newroz çî ye û ji ku der hatiye? Şehname li ser Dehak û zilma wi weha dibêje:

"Her êvar çî ji xelkê, çî ji esilzadeyan du xortan

Nanpêj dîbîr qesra padişah, ji bo jê re bike derman

Ewan dîkuşt û mêjiyê wan dertani, ji bo xwarîna maran..."
 Bî navê Ermail û Kermail du wezirên Dehak hebûn. Evan herduyan çarekê ditin. Her roj ji du xortan yeki serbest berdidan û dişandî serê çîya. Mêjiyê mîyekê datanin dewsa mêjiyê wi û jê re weha dîgotin:

"Li bajarî neji. Ciyê te ê di çîya û zevî ne."

Bî vi awayî her meh 30 xort difiltin.

Roj hat ku hejama van merivên ku ji aliyê tu kesî ve nadihatin naskirin gihîşt 200 kesî.

Nanpêj ji wan re çend mî û çend bîzîman şand zeviyê.

Kurdên niha ji nesla van in û bajarî ji bin ve nas nakin.

Xaniyên wan gîş palas in û di dilên wan de tîrsa xwedê nine."

Şehname dibêje "Kawê Ahenker (Kawê Hesinker) rabû li hember Dehak serî hilani, wi kuşt û Feridon di şûna wi de kir şah.

Omer Xayam ji di Newrûznama xwe de dîwîsîne ku Feridonê Kurd Dehak dil girt, Îranê ji şerê wi rîzgar kir û vê rojê kir cejn.

Morier ji weha dîwîsîne; Her sal di 31' ê Tebaxê de xelkê Demawendê, roja rîzgarîya gelê Îranê ji zilma Dehak bî birtîne û ji vê cejnê re "Çeşnê Kurdi" tê gotin." (Kurtlerin Kökeni, İstanbul 1977. rûp. 68-70, 72-76)

Disa tê gotin ku gotinên 'Ejderha' an 'Zîha', 'Zeha' ku di zîmanê Kurdi de di şûna mar de tên bikaranîn, ji vê efsanê mane.

Li ser agirê Newrozê, ku li serê xaniyan, girên bilind û çîya-yan tê vê xîstî ji, bî du awayan tê peyivandin. Hin dibêjin ku ev agir ji Ola Zerdest maye û ji ber maneya xwe ya pirozbayî, dawiyê di pirozkirîna şerê Kawe de ji hatiye vê xîstî. Hin ji dibêjin ku di şerê Kawe de wek îşareta an nişana destpêkirîna raperinê hatiye vê xîstî. (Pirtûka jorin; rûp. 68-82)

Li ser Kaweyê hesinker, yê li

dîji Dehakê xwinmêj bî gelek awayan hatiye mijûlbûn û nivîsandin. Gelo kijan ji van rast e? An di vê efsaneyê de para rastiyê çi-ças e? Bî bawerîya me, ev aliyê cejna newrozê ew çend girîng nîne. Ya girîng ev e, ku raperîna (isyân) Kawe bî hezarsalan ve di dilê gelê Kurdistanê de jîye. Her sal ji nû ve hatiye biranîn, her sal ji nû ve hatiye pirozkirî û her sal ji nû ve hatiye vejandin. Tîştê ku ji aliyê gelê me ve ew ças sal hatiye vejandin, ne çiroka raperîna Kawe bî xwe ye. Naveroka (muh-tewa) wê ye. Kawe bî xwe xebatkarekî ye û xebatkaran temsîl dike. Dehak ji zordarekî ye û zordariyê temsîl dike. Û tîştê ku em iro piroz dikin, şerê xebatkaran, yê li diji zordariyê û biserketîna vi şerî ye.

Dibe ku li newrozê, tenê bî çavekî mitolojîk ji bê nihêrin. Lê bûyereke mitolojîk bî xwe ji jî jor (esman) ve nanizile. Ew ji daxwaz û xwezîyên gelê çê dibe. Û bî van daxwaz û xwezîyan ve hebûna xwe didomîne. Eger niha newroz li welatê me bî awayekî kit-lewî tê piroz kirin, û di gelê qedexeyê û tadekariyên Kolonyalîstan, ku her sal bî munasebeta pirozkirîna newrozê tên tetbîq kirin, gelê me newrozê piroz dike; sedemê vê yekê hene. Pergala xwin û zilmê li seranserê welatê me iro ji li jîyanê ye. Û bî deh hezaran girtî û pêşmergên me, li diji pergala Kolonyalîsî têkoşîna Kawe iro ji di-

dominin.

Wezifa welatparêzên şoreşger her ew e ku hemû elementên pêşverû yên çanda gel di liberxwedana netewî de kanalize bikin. Tevgera liberxwedana netewî bî van elementên pêşverû vejînin û xurtir bikin. Dî rewşa îro de, divê newroz ne tenê wek cejneke netewî û nişana azadiyê bîmine. Divê ew bibe navgîneke yekitiyê dî nav kes û hêzên welatparêz de... Jî aliyekî dî n ve newroz rasti destpêka baharê jî tê. Dî vê demê de, tebiet xwe nû dîke, sari û dijwariya zivîstane çiyê xwe dîde ronahi û xweşiya baharê. Bî xwenûkirina tebietê ve civat jî xwe nû dîke.

* * *

Koma Netewan, dî 16' ê Hezirana 1976' an de biryar da ku 21' ê Adarê bibe "Roja navnetewî ya lî dijî nijadperestiyê". Dî 16' ê Hezirana 1976' an de, lî Afrika Jêrin lî bajarê Soweto, lî dijî xwendevanên zarû çetliameke hov hat kîrin. 150 xwendevan dî mitingekê de, bî carekî hatin kuştin. Tevgera Xwendevanên Afrika Jêrin (SASM), lî bajarê Soweto û hîn bajarên dî n, dî nav mehên havîna 1976' an de gelek meş û mitingên mezin pêk ani. Mitinga xwendevanên Soweto jî yek jî van bû. Lê rejîma nijadperestên Sipi, jî van protestoyên bêçek re tehemul nekîr, wan dî nav xwinê de fetîsand û heta dawîya havînê 1000 kes şehîd bûn.

Koma Netewan, dî dû çetliama Sowetoyê re, roja 21' ê Adarê wekî roja lî dijî nijadperestiyê ilan kîr. Çetliama Sowetoyê bû sedemê vî biryari.

Lê biryarê Koma Netewan xwe dispêrebûyereke dî n: Dî sala an de, dî nav Yekitiya Netewîya Afrik yan (ANC), çend rêxistinên xwendevanan, sendiqeyên karkeran û hîn rêxistinên azadixwaz de yekitiyeke netewî pêk hat. Yekitiya Netewî bî navê "Manifestoya azadyê" deklarasyonê belav kî û dest bî miting, meş, boy-

Wêneyek ji çetliama gundê Sharpevillê. 21 Adar 1960



kot û grevên kitlewî kîr. Dî 21' ê Adara 1960 i de, lî gundê Sharpevillê, polis û leşkerên dewleta nijadperest agir barandî n ser mitingê karkeran. 83 reşîk mîrî n û 365 jî birîndar bûn. Ev roj jî bo tevgera rîzgarixwazên reşîk bû destpêka gehînekek (merhele) nû. ANC, ku jî roja avabûna xwe (1912) heta vê rojê tenê metoddên têkoşîna bêçek bî kar anîbû; stratejiya xwe guhert. U çebûl kîr ku bê têkoşîna çekdar dê nîkarîbe bigîhîje tu azadiyê. ANC, dî 1961' i de baskê xwe yê çekdar (Umkhonto we Sizwe) damezrand.

Lî kudera dî nê dibe bîla bibe, dema ku çala rejîmên nijadperest dibe, dî rêza serî de Afrika jêrin tê bira meriv. Nijadperestiyê ew çend hov û vekîrî, Kurdistan ne tê de, îro lî tu deverên dî nê nayê ditî n. Ferqa dî nav nijadperestîya Afrika jêrin û ya rejîma Kolonyalist lî welatê me ev e: Ew jî Reşîkan re dî bî jî n; "Hûn çiqas rînd fêrî zîmanê me, çanda me û sistema me dî bî n bî n; disa hûn Reşîk in. Hûn Reşîk in em spi ne Hûn xwe dî ava heft çeman de jî bî şon hûn disa Reşîk in. U wek bav û bapîrên xwe kolên me ne. Lew re jî divê xwendeghên we, aşxanên we, xaniyên we, sendiqe-

yên we û hemû rêxistinên we çîhê bî n. Navê vê "APARTHEID" e. Ev siyaseta bîngehî n ya dewleta me ye. Yê ku lî dijî wê raweste, lî dijî dewletê radiweste. Lê zordarên me çî dî bî jî n? "Hûn çiqas xweş fêrî zîmanê me, çanda me û sistema me bî bî n, çiyê we lî cem me ew ças bî lî n e. Hûn ne kurd Em gîş Tîrk in û bav û bapîran ve birayên hev in. Ev bîngeha dewleta me ye. Yê ku lî dijî veyekê raweste lî dijî dewletê radiweste. Navê vê jî "ASIMILASYON" e.

A jî we re du ruyên nijadperestiyê ku jî aliyê şekîl ve zaf çîhê xuya dî kî n, lê jî aliyê naverok û mantiqa xwe ve yek in. (her du jî lî ser înkarkîrîna mafên bîngehî n yên merivî, demokratîk, netewî û çandî hatîne damezrandî n.) Gelo ne jî ber vê têveliyê (ferqê) be, ku hîn hevalên Tîrk û bîyanîyên dî n nijadperestîya lî Kurdistanê ew ças dereng tê dî gî hî jî n? Eger kolonyalistan dî şûna ASIMILASYONE de, lî me jî APARTHEID tetbîq kîrî bûna; (ynî wek Reşîkan jî me re jî bigotîna: Raste hûn kurd in û lew re mafê we yê jî yanê nî n) dê rewşa me jî bala dewletên çîhanê bî kî şanda?

Divê neyê t jî bî rî kî rî n, ku ne lî Afrika û ne jî lî deverêke dî n, tu gel bî biryarên Koma Netewan rîzgar nebûne.

Gel bî hêza xwe rîzgar dibe.



CIVINA KOMITA NÛNERAN

Dı roja 13-2-1983' an da cara pêşin civina nûnerên komelên endamê Federasyonê pêk hat. Ji 17 komelan 11 nûner di civinê de beşdar bûn.

Kar û barên civinê li ser 5 xalan hatin berevkirin :

- 1- Informasyon li ser xebatên komita karker
- 2- Li ser şeva 19' ê Sibatê

3- Pîrsa lokala Federasyonê

4- Li ser cejna Newrozê

5- Pêşneyar û daxwaz

Dı destpêka civinê da komita karger li ser kar û barên komitê sekini. Paşê komitê bersivên pîrsên nûneran da. Dı vê beşê da komita karger ji bo sala 1983' an programa xwe ya xebatê diyari nûneran kir.

Li ser şeva 19' ê Sibatê navbera nûneran da danûstan pêk hatin û wan li ser şevê baweriyên xwe gotin.

Dı civinê da ji bo bî tehreki baştir Federasyon cejna Newrozê pîroz bike, komita karger li ser pîrozkirina şevê xebatên xwe pêşkêşî nûneran kir. Dı dawiyê da li ser programa şevê dîr û dirêj hat seknandin. Bî taybeti, ji bo beşdarbûna komelan dı şeva newrozê û ji bo baş derbazbûna programa şevê, ji komelan alikari

piştgirtî hat xwestin.

Ji bo hertim lokala Federasyonê vekiri bimine, nûneran baweriyên xwe yek-yek diyar kirin. Disa ji aliyê dın li ser kêmasiyên lokalê ji hat seknandin.

Dı dawiya civinê da nûneran ji bo başkirina karên Federasyonê pêşneyar û daxwazên xwe gotin. Komita karger diyar kir ku pêviste her komelek bî dıl û can di karên Federasyonê da bibe û xwe bide li pêşiya hemû dijwari û çetnîyan.

XEBATA KOMELAN

KOMELA KURDÊN LI GÖTEBORGÊ :

37 SALIYA KOMARA KURDISTANÊ PÎROZ KIR

Komela Kurdi ya Çandi li Bajarê Göteborgê, di 13'ê meha buhuri de bî şeveke çandi ve 37 saliya Komara Kurdistanê (Ma-

habadê) pîroz kir. Ev şev bî beşdarbûna Şivan û Gulistan pêk hat. Hinek beşên dın ên programê şevê ji; def û zırne, xwarina kurdi û govendên

folklorik bûn. Programê şevê bî peyva kurdi û swêdi hat vekirin. Dı dîre, Kurdeki ji Kurdistanê Iranê, li ser rewşa tevayî ya Iranê û şerê Pêşmer-

gan û hêzên hukumeta Xumeyni dîr û drêj peyvi û derheq rewşa aktuel de hun informasyon da guhdaran.

Bajarê Goteborgê, bî mezîniya xwe bajarê duwemin yê Swêd e. Pîraniya Kurdên li Swêd, li bajarên Stockholmê û Uppsalayê dijîn. Ji aliyê pîraniya Kurdan ve, di dîvan herdû bajarên re bajarê Goteborgê tê. Pîraniya Kurdên ku li vi bajari dijîn karker in. Hejmara Kurdên ku li xwendegên bîlind dîxwinin, li vi bajari gelek kême.

Dengbêjên bî nav û deng, Şivan û Gulistan, li ser daxwazê israra guhdaran, giraniya programê xwe dan ser stranên kevn yê folklorik û naskiri. Wek stranên Grabê tê Xaço, Meyrem Xan û hwd. Dema ku Şivan dest bî strandina hun stranên sıvık yê folklorik kir; guhdarên li salonê gîş rabûn govendê.



Wêneyek ji şeva Göteborgê

Foto: Lilli


Komela Kurdên Goteborgê, bî vê şevê ve cara yekem ev çend Kurd, Swêdi û biyanîyan dî şeveke çandi de ani cem hev. Ev şev, bî program û atmosfera xwe, jî her aliyê ve şeveke serketî bû.

Endamê ku li ser navê Komelê peyivî; li ser jiyana li dervey welat, bî kurti weha got :

Xwuşk û Birayên Hêja!

Hîn jî me jî ber zîlm û xezeba dewletên kolonyalist, hîn jî me jî bo parîyeki nanê rojane; me gîşan jî welatê xwe bar kirtîye û em iro li welatekî bî her awayî biyanî dijîn. Bê guman ev ne tenê enî-nîvisa me Kurdan e. Jî gelek welatên bîndest bî hezaran kes, berî me jî hatîne welatên Ewrûpa û salên xwe yê celayê (surgunê) lîvan welatan derbas kîrîne. Gava ku em li yê berî xwe mêze dîkîn; em dibînin ku hîn jî wan bî hatîna Ewrûpayê ve, welatê xwe jî bî ve jî bir kîrîne û roj bî roj dî nav destarên Kapitalîzmê de hatîne hêrandîn, helyane û wînda bûne.


Rewşa me Kurdên li dervey welat jî, jî rewşa birayên me yê Latin Amerîkî an Afrikayî ne zaf çihê tîr e. Yê ku bî civata Ewrûpayê ve pine dibîm, dejenere û deforme dibîm jî nav me jî dertên. Lê dî rewşeke wulo de ku em her roj, jî Dîyarbekrê, jî Mahabadê, jî Sulêmanîyê û jî çar aliyên Kurdistanê xeberên îşkencê û mîrîna birayên xwe dibîhîzîm, ne mîmkîm e ku em bê deng û destgîrê dayî bîmînin! Ne mîmkîm e ew kurdê ku piçek xîret û şexsiyeta niştîmanî pê re mabe, li hember vê rewşê ker û lal bîmîne



Şwan û Gulistan dî şeva Götöborgê de

KOMELA KARKERÊN KURDISTAN LI UPPSALAYÊ

CEJNA PIŞTGIRIYA
ZAROKÊN KURD
AMADE KIR



Wêneyek jî pîrozbaniya zarokan- Uppsala

Dî roja 17' ê Sibatê li zarokxaneke Uppsalayê cejneke piştgiriya jî bo zarokên kurd hat amadekîrîn. Dî vê cejnê da xwarînen kurdî, muzîk û govendên gelê kurd hatînin pêşkêşkîrîn.

Jî aliyê din komela me li ser rewşa zarokên Kurdistanê, zarokên Swêdi û li ser dê-bavên wan baweriyên xwe diyar kîr. Dî zarokxanê da çend wêne (şîkl, sûret) me da nişandîne. Hevale-

ki me bî saza xwe va jî zarokan ra klam-stran gotin û ew jî pêra stran.

Dî dawiyê da zarokên kurd destê hev girtin û bî hevra govend kîşandîm.

DUMAHİKA RÛPELA 13'AN

eniyê de girtîne. Lê belê, idam, windabûna merivan û îşkence jî dom dîke.

Eger parlamento û hukûmet, jî bo xebatên berbiçav biryarê xwe bîdîm; Swêd dê dî vê meselê de xwe bî tenê nebîne. Jî ber ku protestoyên li dijî zordestiya li ser Kurdan li gelek aliyên belav bûne. Li Londra'yê jî demekî berê ve, Komîta jî bo mafên demokratîk û li dijî zortiyê li Iraqê heye. Li Paris'ê, bî alîkarîya hukûmeta Mitterand, jî bo parastîna kultura Kurd enstîtuysîke Kurdî hatîye damezrandîn.

Dema ku Swêd jî dî mesela Kurd de pêşevanî bike hatîye.

Dî bîmînî siya tîştên ku me li jor

pêşkêş kîr de, em pêşneyar dîkîm :

1- Ku parlamento wezîfe bîde hukûmetê jî bo ku înisîyatîv bigire û mesela Kurd pêşkêşî Komîsyona Mafên Merivî ya Koma Netawan bike.

2- Ku parlamento wezîfe bîde hukûmetê ku dî planê navnetewî de jî bo pêkanîna aksiyonên piştgiriya li Kurdan bîxebîte..

17.ÇILEYA DAWÎN. 1983

LARS WERNER
BERTIL MABRINK
NILS BERNDTSON
C. H. HERMANSSON
KARIN NORLANDER
EVA HJELMSTRÖM
OSWALD SÖDEROVIST

SWÊD Û MAFÊN MULTECIYAN

Cihangir Lero

Jı ber bılındbûna şer û têkoşina gelê me iro li Kurdistanê zordestike bêhempa û hişk dajo. Rewşa gelê me hin ji diwartir dibe. Şovenizm nijadperesti û militarizm iro bûye politikaya dewletên zordest. Jı ber vê teda, lê dan, kuştin û eziyeti iro gelek Kurd bi destê van hêzan ji welatê xwe têne dîrxistin. Jı wana gelek ji vi gavê li welatên Ewrûpayê bûne multeci û pır problem iro li pêşiya wan sekmine.

Pırsa multeciyan iro ne tenê li welatê me, wusan ji li hemû cihanê bala pır dewlet û mirovan dıksine ser xwe. Angori istatistikên Rêxistina Yekitiya Netewan (UNO) iro li cihanê nêzkaya 120 milyon multeci hene. Ew ji welatê xwe, nas û pismamên xwe dîr dıkevın, jı berneçariyê heta demekê li welatên biyani (dereke) dıminın. Lê ew her tım bendewarê (çavnêriya) erdê kal û bavê xwe dısekının, rıya carke dın veğerinê dıpên.

Paşi şerê cihanêyi yekemin û duwemin pır kes ji ber diwariyên politik, bı darê zorê va ji welatê xwe hatın dîrxistin. Dı van şeran da bı milyon mirov hatın kuştın, ti - birçi, rût - tazi û belengaz man. Paşi sala 1930' an

bı taybeti li Ewrûpayê kevneperesti û paşverûti hin ji xurtır bû. Jı mirtiv û cihuda bıgre heta demokrotan, nıviskar, zane û komınistan gelek mirov ji welatê xwe hatın dîrxistin. Paşi zevtkırına erdên Awusturyê, çekoslovakıyê pır mirovên bêgune derketın serê rıyan, koçer bûn. Dema Hitler Ewrûpa seranser xıste bı bandûra xwe, wê çaxê ji Norveçê 43000, ji Danımarkê 18000, ji Finland 110 000 û paşi sala 1940' an disa ji welatê Baltık 40 hezar kesın xwe avêtın ber bextê dewleta Swêdê.

Dı vê demê da li Ewrûpayê nêzkaya milyon multeci hebûn. Lê belê, dı nav van salan da em dıkarın bêjın, çet serbesti û mafên multeciyan tune bû.

Pışti şerê cihanêyi duwemin rewşa multeciyan û problemên wan, bala pır rêxistina kışande ser xwe. Dı sala 1951' an da li bajarê Cenewrê li ser başkırın, xweşkırın û serrastkırına rewşa multeciyan peymanek hate gırê dan. Serbesti û mafên wan dı nav çarçewa vê peymanê da yek - yek hatın diyar kırın. Jı bo parastına mafên wan her dewletekê berpırsiyarik hılda ser milê xwe. Dewletên li bınê vê peymanê destnıvisarên xwe avıtın,

hewcedar bûn:

1- Dı vi wari da jı bo karên UNO her dewletek pêviste alıkarıya abori bıke.

2- Her dewletek pêviste nêzkaya hejmarekê multeciyan hılde.

3- Her dewletek pêviste hoy - mercên dij multeciyan protesto bıke.

Dı xala dawiyê da ji hatiye gotın ku, ev dewletan ji bo parastına maf û serbestiyên mirovi mafên demokratik - netewi li dij êrişan raweste.

Multeci kiye, şûna wi çıye, mafên wan çıne, li ser van pırsan heta nıha pır danûstan û dıksıyon pêk hatine. Gelek bir û baweriyên cihê - cihê derketine maderê (meydane). Dı pratikê da jı pır cudati car - carına peyda bûn. Lê, paşi peymanı Cenewrê dı sala 1951' an da pır tışt zelal bûn û xetên şûna multeciyan hatın kışandın. Angori vê peymanê multecik vi tıhri de naskırın ; "Kesek li welatê wi li ser zordestike politik hebe, zırarek (risk) dıghêje wi, ev kesê biyani multeci ye. Ew kes endamê grupeke cıvaki be, jı ber bir - baweriyên netewi, oli (dın) û jı ber peywendiyên politik eger ew kes dı bı zordestikê da dımine, bı rasti ev yek zordestike politike. Ev zordesti li diji maf, jıyina

keseki be û hin diwariyên dın pêkbine an jı dı warê curmên politik da ceza bıbine, ev yek zordestike politike." (1)

Lê dı pratikê da, li gelek welatan jı ber cihê bûna rejimên car - carına pır cudati peyda dıbin.

Li Swêdê ev naskırına jor dı zagona bıngihin da cih gırtıye. Jı aliyê dın li Swêdê organên rêvabırınê, zagona bıyaniyan jı dı vê çarçawê da hin tıştên dın ji ser da zêdekirine.

Dı xaleke vê zagonê da hatıyê gotın ku, "Keseki multeciyê politik nın be, jı ber rewşa politik li welatê wi, weki nexwaze here welatê xwe û dı vi wari da tıştên berbiçav nişan bıde, diwariyên mexsus tunebe, ew kes dıkarê li şuna xwe bımine" (2)

Kesên multeci çawa dıkarın bın Swêdê ? Jı bo hatına Swêdê du (2) rê hene ; Yek bı alıkarıya Rêxistina Yekitiya Netewan (İntergoernmental Comitte for European Migration) û bı hevkarıya berpırsiyarên Swêdê ve pêk tê. Bı saya peymanên hevkarıyê va dı nav şerê navnetewi da kesên ku dı kampên (starên) multeciyan da dıminın, tın Swêdê. Carına jı hin multeci bı serê xwe tın, ev jı rıya duduya ye.

Kesên ku tèn deriyên sinoran pêvistin destûra xebat û rûniştandinê bîstînin, bo vi yekê polêsên Swêdê wan hildidin bin çavan, pîrsiyaran dîkin û wan kontrolê ra derbaz dîkin. Ev kesana jî ber çî hatine Swêdê, pêviste jî yîna xwe ya politik dûr - dirêj jî polês ra şirovekin. Bî destûra SÎV (Daira nîyan ya Dewletê) polês bîyareki digre û daxwaza multeciyan vê rêxistinê ra dîghine. Paşê multeci pêviste benda bîyara vê rêxistinê bîsekîne. Angori rewşa wi kesî ev rêxistina bîyarê xwe digre. Bîyar dikare negatîf an jî pozîtîf bibe. Ev yeka bî ifadê multeciyan va grêdaye.

Bo vê yekê keseki multeci pêviste ifadeyên xwe rast, zelal û tehreki berbiçav (konkret) jî polês ra pêşkêş bike.

Xên jî van herdu riyên bîngêhin rêke dîn jî heye, ew jî keseki multeci dema

ku destura xebat û rûniştandinê stend, ew kes dîkare jin - zarokê xwe jî bine. Bî vi tehri yekîtiya malbatê dîkare pêk bê.

Bî alikariya van riyan dî salekê da nêzkayî 4000-5000 kes lî Swêdê dîbin multeci. Dî navbera salên 1950 û 1980' an da lî dora 75 hezar kes hatin Swêdê

Hemû multeciyan ku têne Swêdê mîrov dîkare dî nav du beşên mezîna da berev bîke. Hîne multeci bî destê an jî dî bin bandûra komisyona multeciyan da têne Swêdê (Ev komisyon bî Rêxistina Yekîtiya Netewan va grêdaye). Carîna jî bî navê mîroveyatî, bî navê rûmeta mîrov Swêdê dîkare multeciyan bîparêze û wan ra deriyên xwe veke. Dî navbera van herdu beşan da kategoriyan da cudatîyên ewqas mezîna tunî. Lê belê multeciyan bî destê komisyona multeciyan va têne Swêdê, jî ber rewşa abo-

riya welat hejmara kêma, an zêde nabe, Kesên dewleta Swêd bî serê xwe wan dîke multeci, hejmara wan jî ber rewşa aboriya welat dîkare kêman jî zêde bibe. Bî destê wezîretê kar lêgerînek lî Swêdê ser van pîrsan hatîye pêkanî. Angori vê lêgerîna bî navê "Swêd û Multeci" "Mafê multeciyan û bîyarên UNO jî ber politikaya sîka xebatê, jî ber rewşa Sosyal - aborî kes nîkare multeciyan şûnda vegerîne û wan nehêle Swêd" (3). Bî vi tehri mîrov nîkare bêje, Swêd tenê jî bo xêra xwe, jî bo "hêza karê erzan" multeciyan tîne welatê xwe. Wekî tîşteki wusan hebûya, dî van dawîyan da Swêdê pêvist dî deriyên xwe jî multeciyan ra bigirta. Çûmki iro angori îstatîskên dawîna hejmara kesên bêkar 170 hezar e. Lê dîse jî iro multeciyan bî serê hatîne pîr zîrar dîghêje wan û rewşa wan jî ewqas ne başe

Bî rasti wekî em iro perçeki çavên xwe lî ser rewşa cihanê bigerînin, problema multeciyan ne-sekîniye, dajo. Pîrsên netewî, şer, zordestîyên politik, teda, lêdan, dijaye-tîyên olperestî û wek van pîrsan gelege pîrs lî pêşîya pîr welatan sekîniye. Jî vana yek jî pîrsa multeciyan Kurdî. Pêviste Federasyona Komeleên Kurdên Swêdê dî vi wari da serê xwe bêşîne û alikariya multeciyan Kurdî bîke, pîrsên wan va mijûl bibe.

Pîrtukên ber destan ;
1- Jonas Widgren, Svensk invandrar Politik (Politikaya Swêdê lî ser Multeciyan) 1982, Rûpel 103
2- Lêgerînen Dewletêye Resmî; Nya uttlannsklagen (Zagona Nû ya Bîyanîyan) 1979, Rûpel 72
3- Sverige Och Flyktingar (Swêd û Multeci) Arbetsmarknadsdepartementet, 1978. Rûpel 14



Qısa jorin, dı nıvisarek MON-TAIGNE de derbaz dıbe. Bı zımanê latini hatiye nıvisin. Meriv dıkare vê qıse wısa wergerine; ciheki (mewkiyeki) bılınd, nireki mezin e ji. An ji wek dı qıseyê pêşiyân de têt gotın; "Serê çiyayê bılınd her bı mij e."

Wısa ye, dawıya zanıbûnê û pêşketinê tune. İBNİ RUŞT dı dema serketına islamiyetê de wısa dıgot; 'merıvıyî bê mırın, zanin bê dawı ye.' Bı hezaran salên cihana me ya pir, dı şerê navbera zanin û kospên lı ber zaninê de derbaz bûye. Meriv ji hebûna xwe heta iro qet ji zanıbûnê têt ne bûye. Lê disa ew meriv, ji hebûna xwe heta iro dji zanıbûnê ji rawestayê.

Dı dema antik de, HERAKLİ-Tİ'YE Yewnani wısa dıgot; "Meriv nıkare du caran bıkeve çeme-ki. Hemû tışt dı nav herıkandine-ki, ku ji dıjitiya avabûyi ye." Herıkandına tarixê heta iro hat. Bı milyonan mırî, bı sedan bajarê tar û mar, qası çend behra hêstêrên çavan û qası çend sed salan hêviyên şikestî lı dû xwe berda û hat. Xwe gıhand iro. Bê guman ji iro pê ve ji dê dom bıke. Ê em ji, hebûnê nı pıçûk, ango meriv ji, -weki ARAGON dıgot- qası kırdeyên xwe dê dı nav herıkandına tarixê de bın. Bı daxwaz, hêvi, qahr, çeyî û xırabiyên xwe ve...

Dı behra zanıbûnê de, her gawe teze bı xwe re dijwariyên xwe ji tine. Destpêka zanıbûnê, fêrbûnê xweş e. Her tışt weki berbanga sibê zelal e. Daxwazi heye, xıret heye. Lê pıştı demek ew daxwaza destpêkê tune ye êdi. Lew re meriv fêri fêrbûnê bûye êdi. Ê dı behra zanıbûnê de tıştê heri dijwartır ji ev e; fêri fêrbûnê bûyin e. Jı ber ku meriv divê her bıdomine. Her fêr be.

MAGNA SERVITUS EST MAGNA FORTUNA

M. Ferzend Baran

Ew yên, ku dı bın barê domandına fêrbûnê de dımının û her û her janên wê dıkêşının, ronak bir in. Ew dilên (koleyên) zanıbûnê ne. Heta bıjin her wısa dil in. JEAN PAUL SARTRE dı kurtenıvisara xwe ya; "Nıvisandın, bo çı nıvisandın" de behsa nıviskariya xwe dıke. Dıbêje; "... pıştı wenda kırına xewnan ji disa meriv dıdomine û dınvıvisine..." Lew re meriv êdi fêri fêrbûnê bûye.

Gelo fêri fêrbûnê bûyin tışteki xırab e? Na xêr. Meriv her dı nav herıkandına tarixê de ye. Wê gavê meriv çıma bı daxwaz, xıret û avayiyên xwe ve yek ji dilopên behra zanıbûnê ne be? Fêrbûnê pêşketın maratonek bê dawı ye. Loma ji dijwar e. Bı jan e. Lê dı gel vê de, xweş e ji. Weki jıyana meriv rınd e. Weki 9 mehên dı zıkê dayıkê de bûyinê ye. Pêkhatinek, avabûnek hêja ye.

II

Rast e, serê çiyayê bılınd her bı mij e. Baş e, serê çiyayê nızım çawa ye? Serıyeki bı mij an serıyeki rût hin hêja ye? Dı nav behra zanıbûnê de dilopek bûyin an dı hemberi herıkandına tarixê de kospeki bûyin baş e?

Ez bawer im, ev pırs bı taybeti bo geleki wek me bındest û neçar, gelek grıng in.

Avayiyên hêja ji ber xwe ve ava nabın. Xıret divê, zanıbûnê divê, daxwaz divê. Hilberiyek hêja, pıştı hezar xebat û lebatı dertê. Disa JEAN PAUL SARTRE dıgot; "MERIV DIVÊ HER TİŞTİ BIXWAZE KU TİŞTEKİ BIKE."

Jı bo me û gelê me ji wısa ye. Em ji divê her tıştı bıxwazın ku hınêk tıştan avakın. Em, gelê me, hewcedari her tıştı ne. Kê maniyên me bı hezaran, gengaziyên me bı hejmarên yekan in. Dı her wari de em dı nav tengasiyeki mezin de ne. Dı warê edebiyat û kultur de ji wısa ye.

Tarix dıherıke. Ê benda tu kesi nasekine. Benda me ji nasekine. Nabêje, "Kurdên belengaz paştamayı ne, ez divê benda wan bım." Tu cari tarix wısa dıltenk ne bûye. Ew her dıherıke. Em divê xwe bıgıhının wê. Em divê dı maratona fêrbûnê pêşketinê de bı lez bın. Bı xıret û xwedı daxwazi bın. Jı ber vê yekê ji armanç divê -her çıqas nireki mezin be ji- cihek bılınd be. Ango çiyayeki seri mij be...

Her waha berpırsıyarê sedsala xwe bûyin û lı gor herıkandına tarixê gav avê tın ji yek ji grıngiyên armançên hêja ye. Kê maniyên me yên heri mezin, dı wari de ne. Wek gelê ronakbirên wı, em çıma xwe bı tıştên rojê û sıvık tının. Bındesti û dijwariyên bındestiyê me bı hevsarên xwe

ve grê dane û bernadin em tu gavi bavêjin. Bernadin em xwe ragihînin sedsala xwe û bîbin dilopek dî behra zanîne de...

Dî qîsa jorin ya latini de FORTUNA navê xwedayek e ji. Dî dema antik de Roman ji xwe re -bo serfirazi û pêşketinê- xwedayek xweşik ditibûn. Navê wê ji Fortuna danibûn. Dîxwestin dî şerê pêşketin û serfiraziyê de Fortuna ji wan re alikari bike. Alikariya Fortuna' yê çiqas bûye? Kes vê yekê nizan e.

Lê tiştê têt zanin êdî Fortuna û xwedanên dî dî rûpelên kevnar yê tarixê de manin. Meriv, xiret û zanibûna wî heye iro. Pêşketin, serfirazi bese bî zanibûn, daxwaz û xireta merivan mîmkî e iro.

Me ji ev yeka dîvê iro.

III

Lî Swêd ev çendeki ye kovara BERBANG têt weşandin. Pîraniya nivîskar û ronakbîrê Kurdan, ku lî dervayî welat û Swêd in, hilberiyên xwe dî wê de diweşînin. Lî Fransê Enstituya Kurdi ava dibe. Lî hinek cihên dî -periyodîk ne be ji- kovar û pirtûkên zarokan xwe şani didin. Dengbêj, hozan, çirokvan êdî lî der û dora xuya dibin. Yek caran ji pirtûk bî zîmanê Kurdi dertên.

Gelo ev yeka dî warê kulturi de nişana pêşketinê ye? Em dê bîbin...

IV

Dî hejmarê bûri ya BERBANG'ê de, bî navê "Çî xulê me hebû dî tarixê merivan de" nivîsarek mî derhat. Hevalên berpîrsiyar dîxwestin ez ji bo her hejmari tiştê lîkîm. Tu sedem ne bû, ku ez bîbêjim na. Ê dî nivîsara bûri de lî ser bîngehî meriv kombînyonek ji ARAGON, PABLO NERÛDA, D.H. LAWRENCE Û XALÊ EVDO çêbû. Gelo ev çî bû?

Dî zîmanê Kurdi de ji ev formê edebî re çî têt gotin, rasti ez bî xwe ji nîzanim. Mî lî ew ferhengokên ba mî bî nîhêrt. Lê, nîkarîbû bîdîta. Jî çend hevalên, ku tîkîliya wan bî zîmanê Kurdi ve heye ji pîrsî. Mî ji wan hevalan ji nîkarîbû bersîvekî xwas bîgîm. Wîsa bêî ku em jê re navêkî bîbin, mî dest bî nivîsandîne kîr.

Dî zîmanên ewrûpeyî de ji vî formî edebî re "essay" têt gotin. Dî tîrkî de "deneme" dîbêjin. Bawer mî Tîrka raste-rast ji zîmanên ewrûpeyî wergerandîne. Bî kurtebîrî ji ev formê edebî re wîsa gotin mîmkî e; lî ser warekî jîyanê an tiştêkî, bî şewekî aza nivîsandî e. Nîvisar bî xwe zêde dîrêj nînin. Ê ne çîrok mî, ne ji nivîsarên akademîk mî. Lê ev herdu ji dîkarî dî nav de bî. Cudabûna wê ya herî gîng jî formên dî, jî xwe ev e; bî alîkariya bîkaranîna formên dî, formekî taybetî ava dîke. Ev form, bî alîkariya formên dî (wek roman, çîrok, helbest, destan û hwd.) xwe dîgîhîne armançên xwe.

Ev form dî navbera xwe û xwendevanan de pîreki jîndar ava dîke. Wekî nivîskar bî xwe û xwendevanan ve dîpeyîve. Bî vî awayî nivîskar, xwe radîgîhîne xwendevanan û şîret û rexnê wan werdîgre. Bûyer, serbûrî û jîyana rojê, jî bo vî formê gîng mî. Her waha tarix û weşan jî.

Gelek tiştên cûrbecûr dîkarî dî nav nivîsarek waha de cîh bîgîm. Mana vî yekê tevihevîbûn nîne. Tiştên cûrbecûr, lî gor pergalêkî (duzenekî) rêkûpêk henî.

Pêkvanê ev formê taybetî MICHEL DE MONTAIGNE ye (1553 - 92). MONTAIGNE jî Fransa'yê ye. Ew filosof û nivîskar bû. Dî dema xwe de gîranîyek pîr mezî lî ser jîyana ramani ya Fransê çêkîrîbû. Dî damezrandî û pêşvexîstîna edebîyata Fransî de cîhê MONTAIGNE gîng e.

MONTAIGNE dî nivîsarek

xwe de dî derheqê xwe de wîsa dîbêje; 'Her nivîskar xwe şexsî û bî hînek arîzîyên xwe yê ecêb ve dîde nasî. Belam ez, xwe, ne wekî zîmanzane an jî hozan an jî parêzer (avûkad) didîm nasî. Ez, berî her tiştî bî şeweyê xwe ve û wekî MICHEL DE MONTAIGNE dîxwazîm xwe bîdîm nasî.'

V

Bîla xwendevan mî bibexşînin, ku ez lî ser daxuyana vî formê rawestam. Kêfa mî jî daxuyanên wîsa re nayê. Lê mîxîbî dî zîmanê kurdi de hêj jî daxuyanên wîsa pêwîst mî. Wekî dî qîsa latini de dîhat gotin, heta em negîhîjî cîhekî bîlînd an ne bî çîyaki sermîj, em dê her hewce-darî daxuyaniyên destpêkan bî.

Xwezi em dî cîhekî bîlînd de bûna û bîla nîrê sîtûyê me jî hebûya. Xwezi em çîyaki bîlînd bûna û bîla serê me jî dî nav mîj de bûya...

Xwezi cîhê tacîrkeran em dîlên (koleyên) zanîbûnê bûna...

EZÊ HERIM KURDISTAN
ŞÎN BIKIM BAX Û BOSTAN
HETA NEBÎNIM WELATÊ XWE
PIYÊ MÎN NAÇE GORISTAN

EZÊ HERIM WELAT
AVAKIM BIRC Û XELAT
NAVÊ ŞEHÎDÊN KURD
BILINDKIM WEK SÎPAN XELAT

MÊDYA (5 SALÎ)



Lars Werner,

PARTIYA KOMUNISTA A SWÊD (VPK) VÊ CARÊ BI ÎMZA SEREKÊ PARTIYÊ LARS WERNER Û HIN ENDAMÊN DIN ÊN MERKEZA PARTIYÊ PÊŞNEYARNAMEYEK DA PARLAMENTOYA SWÊD. VPK, BI VÊ PÊŞNEYARNAMÊ DIXWAZE HUKUMETA SWÊDÊ PIRSA KURDISTANÊ PÊŞKÊŞI KOMA NETEWAN BIKE. EGER XWEDEVAN BI BÎR BÎNIN, PARLAMENTEREKÎ VPK BERÊ JÎ ÇEND PÊŞNEYARÊN WEHA ANÎBÛ PARLAMENTOYÊ, LÊ TENÊ BI ÎMZA XWE. EM VÊ PÊŞNEYARÊ KURT DIKIN Û WERDIGERININ KURDÎ

PÊŞNEYARNAME
MEWZÛ: JI BO PIŞTGIRIYA
KURDAN
XWEDIYÊ PÊŞNEYARNAMÊ:
LARS WERNER (SEREKÊ VPK)

Hukumeta Swêdê û Parlametoya wê dê kengê li dîji zilm, tadekari, îşkence, mahkemên kitlewî û dardakirînên ku li Asya Roava li hember gelê Kurd tîn kirin dî planê navnetewî de tişteki berbiçav bike ?

Komisyona kar û barên derve ya parlamentoyê idia û delilên li ser zilma li Kurdan dibe her sal qebûl dike. Ev tişteki xweş û rind e. Wek cara dawîn, dî meha Çiriya Pêşin 1982' an de got: "Komisyona dî wê baweriyê de ye ku divê em bala xwe ji ser gelê Kurd nekîşînin û bixebitin ku mafên wî yê merivî, siyasî û çandî hem bîn qebûl kirin û hem jî dî pratikê de bîn tetbîq kirin".


Lê ev ditîna derheq xebata ji

bo mafên Kurdan dî pratikê de, jî bili vê daxuyaniyê, ku dî dawîya mutala Komisyonê de ci digre, nagihîje tu netîceyeke dîn: "Komisyona kar û barên derve ya parlamentoyê dixwaze, tayîn kirîna kanal û metodên ku dê ji bo her rewşekî taybetî bîn bî kar anîn bîspêre hukumetê."


Hukumetê heta niha çî kirîye ? Hukumetên baskê rastê û wezirên wan yê kar û barên derve zordariya li ser Kurdan mahkûm kirin. Sosyal dîmokratîtan jî, dema ku dî pozisyona mîxalefetê de bîn wîsa kirin. Heta ku em zidê vê yekê nebin, em dê wîsa qebûl bikin ku ew dê vê pozisyona xwe dema ku dî hukumetê de ne jî bîparêzin. Lê eger bî rasti herkes li ser zilma ku li gelê Kurd dibe wîsa bî awakî dîleşwîti yek e, divê dema ku em ê dî ji gotîne derbasî kirîne bîbin hatibe.

Tiştê ku Swêd û hukumeta Swêd dikare niha bike, pêşkêş


Vpk DIXW KURD BIBE KOMA



Oswald Söderqvist,
 Parlamenter. Wek dostê
 Kurdan tê naskirin.




Eva Hjelmström,
 Parlamenter û Endamê Mer-
 keza VPK



C H Hermansson,
 Parlamenter û Endamê Mer-
 keza VPK

AZE PIRSA ISTANÊ NETEWAN



Nils Berndtson,
Parlamentar û Endamê Merkeza VPK



Karin Nordlander,
Parlamentar û Endamê Merkeza VPK



Bertil Måbrink,
Endamê Merkeza VPK û Serrekê Gurûba Parlamentoyê.

kırına meselê dı Komisyona Mafên Merivi ya Netewan de ye. Dı munaqêşan de hat idia kırın ku aksiyoneki waha, dema ku bı ser nekeve ji karê bêtir dê li zerara gelê Kurd be. Disa hat gotın ku ji bo biserketına vê aksiyonê pêwist e ku bir û rayeki (efkari umûmi) navnetewiyi firetir lê piştgiri bike û hal hazır şertên pêkanina bir û rayeki waha ji tune ne. İdiaki dın ji, ku meriv nikare cıdı bıbine, ev e: Swêd niha ne endamê Komisyonê ye.

Dibe ku bir û rayeki navnetewiyi fire ku li doza Kurdan piştgiri bike tune be. Lê eger em bawer in ku Kurd bındest in û dixwazın ji bo wan bıxebitın; divê em tişteki bıkin ku dı vê meselê de bala bir û raya navnetewi bıkışın. Munaqêşeki dı Komisyona Koma Netewan de, dê bıkarıbe tam vê tesirê bike û lew re ji destpêkırına munaqêşeki waha - be ku em bıfikirin dê biserkeve an na - gelek gring e. Munaqêşeki waha çıqas zerarê bıgihine gelê Kurd ji nikare ji zılma ku iro li Tırkiyê, İraqê û İranê li gelê Kurd tê kırın bêtir zerarê bıgihinê

Tırkiye ji gelê Kurd re bûye girtigehek. Mahkemên kitlewi yên ku li bajarê Diyarbekır tén ajotın tenê li dij mıxalefeta Kurd tén ajotın. Sûcên ku dıspêrın mıxalifên Kurd "terorizm", "separatizm (buluculuk)", "propaganda Kurdi" an ji "Komunizm" e. Bı qası ku em tédıgıhın, Cûnta Leşkeri ya Tırk bı idiakırına "sûcên" waha dıxwaze mıxalefeta li dıji xwe bıpelçiqine û zılma xwe meştû bike. Kurd, li Tırkiyê tu cari nebûne xwediyê tu mafan. Wek xelkeki heyi û cuda nehatine qebûl kırın. Zımanê wan tım qedexe bûye û niha ji qedexe ye. Xwendına bı Kurdi ne serbest e û nikarin tu tişteki bı Kurdi çap bıkin.

Cunta leşkeri ya Tırk dest bı tetbıqırına zagona bıngihin (anayasa) ya nu kırıye. Ev, zordarıya ku ji berê ve ji li Kurdan dı-

hat kırın hin dijwartır dıke. Zordestiya li ser zımanê Kurdi bı şekleki qanûni bı ci dıke. Berê, bı rıya gırtın û hukmên zagona cezayı dı pratikê de nedıhıştın ku zımanê Kurdi bê bıkaranın, lê niha vê yekê bı hukmê zagona bıngihin dıkin. Zagona bıngihin ya nu ji bo ku, bı gotına wan, "pêşıya xûc bê gırtın" mafê cêli (surgun) kırın û ciguhastınên mezin dıde wan. Beşeki mezin i zagona bıngihin ya Tırk raste - rast li dıji Kurdan e. Kurd bı xwe dıtırısın ku ev, destpêka kampanya jenosideki nu li dıji wan be, çawa ku berê li Tırkiyê hatıye kırın.

Li İranê rejima melan ji li dıji Kurdan şereki dijwar dıke. Ji 1979/1980' yi vir de leja dı navbera hukumeta İranê û Kurdan de dom dıke. Bı kêmani 12 000 kes, wek her gav pırani kesên sıvil, jin û zaro hatıne kuştın. Melên İranê, bı ser gund û bajarên Kurdistanê de bı balefıran bomban dıbarının. Dı nav van de bombên napalmê ji hene. Ji ber kêmasıya imkanan gelek bırandar dımrın.

Hukumeta İranê herema Kurdan ji bin ve bloke kırıye, nahêle tu xwarın û vexwarın, derman û petrol têkevê. Bı bombardımanan xaniyên wan hıldıweşıne. Wusa bûye ku Kurd li welatê xwe koçer bûne. Bı kêmani 35 000 kes bêmal mane û li serê çıyan dı holıkan de an ji şıkeftan de dıjin; dı iklimeki wısa de ku ji ber hışkayıya zıvıstanên wê, barkırına ji cıyeki bı bal cıyeki dın ve gelek dijwar e. Hukumeta İranê, dı payıza 1982' yan de leja xwe ya li hember Kurdan geştır kır. Lew re ji dıbe ku dı nav van mehên dawın de rewş zaf xırabtır bûbe.

Lê liberxwedan dom dıke. Ji dema ku têkoşına çekdar dı 1976' an de ji nu ve destpê kırıye, hejmara leşkerên liberxwedanê her zêdetır bûye. Ji 1981' an vir de, li İraqê eniyeki(cephe) mıxalefetê heye û rêxıstınên Kurdan ji cıyê xwe dı nav vê

dumahık li rûpela 7' an e

KURTENIVÎSAREK LI SER DÎROKA ZIMANÊ KURDÎ YÊ NIVÎSANDÎ

Reşo Zilan

Ji hejmeta 7' an dom dika

Ne bes hinde, lê belê di pirtûkeke din de hin îdiayên ecêbtir hene. Navê vê afirandinê "Şewq ul-musteham fî ma'rîfet rimûz el-eqlam" e. Qaşo "Ehmed bin Wehşîye el-Nebeî" di sala 241-ê koçî (855-ê zayînî) de nivîsiye. Nivîsevan di pirtûka xwe de alfabeke pir ecêb berpêş dika û dibêje, ku qaşo wî "di pirtûkxaneke Bexdayê de pirtûkeke kurdî ye 3 bergî ditiye, ku bi vê alfabe ya pir ecêb hatiye nivîsandin." Herweha dibêje, ku "di vê alfabe de hin tîpên taybetî hene, ku ew di hîç zimanekî din de jî tune ne..." (20) Me dil nîne, ku em li ser van îdiayan bi dût û dirêjahî bipeyîvin. Lê, em bersiva mamoste Cemal Nebez ya di warê vî pirsî de pir maqûl û di cihê xwe de dibînin. Ji lew re jî, em dixwazin wê bersivê bêî şilovekirin ragihînin we. Ew weha dibêje: "Rastî ev e, ku besserincû balaxwedaneke piçûk e vê pirtûkê jî, ku bi zimanê erebî hatiye nivîsandin, dê bi me xweş bide xuya kirin, ku nabe ku erebîzanekî bi navûdeng î mîna Ehmedê kurê Wehşîye yê Nebetî ew nivîsandibe. Lê heye ku yekî biyanî ew pirtûk bi rêk xistibe, ku bi xwe jî erebî baş nezaniye." (21)

Heke mirov wext û keys hebe, dê bikaribe, çî di warê ziman,

bêje û folklor û çî jî di warê dîroka Kurdan de be, pir îdiayên holê erzan û bê ser û ber derbixe meydanê. Lê me dil nîne, ku em vê gavê serê kesî bi van îdiayên vala û pûç ve biêşînin û li ser wan yeko-yeko rabiwestin. Lê belê, me dil heye ku em li vê jêrê li ser "belgeke" hîn heleztir rabiwestin û lê hûr binêrin. Ji ber ku ew bê tirî 50 salan e, ku wê "belga dîrokî" serên pir kesan êşandiye û mêjiyên pir kesan jî tev li hev kiriye. Ev "belga dîrokî" jî perçeçermek e, ku li gor salixan, li bajarê Silêmaniyê û di şikeftê de hatiye dîtin. Wek hemû kesên ku li ser vi perçeçermî mijûl bûne û lê hûr bûne, me jî bal û dêna xwe da dîrok û çîroka wî. Li bingeha peydabûna wî gerîn û lê koland. Dawî dawî me çîroka wî bi alîkariya birayekî xweşdirî di afirandinê de, ku navê wê "Zarî Kirmancî" ye, dît. Welê xuya ye, ku ew çîroka ha ya ku di vê afirandinê de hatiye weşandin, ser û çavkaniya dîroka vê "belgê" pêktîne. Ji ber vê yekê, em hewce dibînin, ku wê çîrokê mîna ku di pirtûka "Zarî Kirmancî" de hatiye belav kirin, werbigêrin zara-vayê kirmancî û pêşkêşî we bikin. Ev ew çîrok e;

"Sermayeke giranbiha ya dîroka Kurdan"

"Delê: Jale Bo wa talît?
Delê: Le ber biramirdin.
Gulit bo wa cuwan e?
Delê: Le ber dost û dujmin."
(ji gotinên bav û kalan)

"Di çaxa hezretî Emer û di sala 19-ê koçî (640-ê zayînî) de, helbestvanekî Kurd ji ber dilgîrî û dilsoziya xwe ya kurdîtiyê, ev rêzên han kirine helbest. Gerokêkî (tûrist) Îngilîz li Silêmaniyê rastî derwêşekî tê t. Derwêş li kuçekê rûniştiye û li hawîrdorên wî jî gelek jin rawestîne. Gerokê Îngilîz jî serê xwe ber bi pêş ve dibe û dibîne ku derwêş bi tîpên pehlewî yên kevn li ser perçekaxezan tiştina dinivîse û dide jinên li hawîrdora xwe. Gerok jî ecêbmayî dibîne, ku çilo ew dewrêş dikare bi tîpên pehlewî binivîse. Jê dipirse û dibêje: "Ya derwêş, tu jî ku fêrî vê nivîsandinê bûyî?" Derwêş dibêje: "Pirtûkeke min heye, ji ber wê fêr bûme û dinivîsim." Gerok dibêje: "Ka li kû ye? Bi min nîşan bide!" Li ser vê, derwêş ji hebana xwe perçeçermekî derdixe û dide destên wî. Ew jî lê hûr dibe û dibîne ku ew helbesteke çarmalîkî ye. Bi kurdiya kevn û bi tîpên pehlewî ye, ku derwêş ji ber dinivîse, dika nivîst û dide jinan." (22)

Nivîsevan, piştî vê çîrokê ew herçar malikên ku jê hatine kad kirin, belav dika. Berî ku em wan malikan ji pirtûkê werbigirin û li vê jêrê binivîsin, divê em ji hin pirsgerêkên xwendinê yên kesên cihê cihê bidin xuya kirin. Ji ber

ku ev metn li pir ciyan hatiye weşandin, kesên ku ew weşandine, bi awayên cihê cihê xwendine û nivîsandine. Mixa bin, ku ne bi tenê me, lê belê hîç kesekî metna xwerû û orijînal neditiye. Ji ber vê yekê jî em bi xwe nikarin ji xwerû û orijînal ku çaqso bi tîpên pehlewî hatiye nivîsandin, her yekser werbigêrin tîpên latînî. Kesên ku li ser vê metnê xebitîne, yan jî jê kad kirine û ew belav kirine, gelek in. Lê em ê di nav van kesan de bala xwe bi tenê bidin nivîsara D.N. Mackenzie (23) û afirandina Reşîdî Yasimî

(24), Ekrem Beg (C.P.B.) (25) û Merdûxî Kurdistanî (26).

Em bi xwe gihîştine wê baweriyê, ku metna di pirtûka "Zarî Kirmancî" de ser û çavkaniya bingehîn e. Ji lew re jî em ê wê wek xwerû û orijînal metnê çebûl bikin û wê werbigêrin tîpên latînî. Paşê jî metnên ku di nivîsar û afirandinên kesên jorîn de, yên ku me ji navên wan kad kirin, li bintara guhartoka xwe û deq bi deq berpêş bikin. Em ê bi vî rengî nîşan bidin, ku ka wan ew peyvên ku di helbestê de

derbaz dibin bi çi awayî xwendine. Tevî vê jî, ji ber ku çi Mackenzie be û çi jî Merdûxî Kurdistanî û heta Reşîdî Yasimî bin, ev metn wek hevdu xwendine, em ê çima xwe bi tenê ya Mackenzie bînin û navê wi bi kurtî (M.) binivîsin. Lê em ê hin peyvên ku Reşîdî Yasimî (R.Y.) bi awakî din xwendine jî bidin xuya kirin.

Ev e metna wê helbesta çarmalikî ;

Kurmanciya îro ya vê helbestê ;

Hormizgan (1) Reman (2) afiran (3) kujan
Hoşan (4) şarewe (5) gevregewrekan (6)
Zorkire (7) Erebe (8) kurdîne (9) xapûr (10)
Genane (11) pale (12) beşî (13) şarezûr (14)
Jin (15) û kenikan (16) we dîl beşînan (17)
Merd (18) aza tîlîn (19) ji rûy (20) hewînan (21)
Rewîştî (22) Zerdeşt mayewe (23) bî des (24)
Bîzîka (25) nakit (26) Hormiz (27) we hîç kes (28)

Hurmizgeh hilweşandin, agir vekuştin
Giregirana xwe veşartin
Zorkerên Erebe kirin kavi
Gihîştin gundên heta şarezûrê
Jin û keç bi dîl birin
Mêrên aza di xwînê de gevizandin
Rewîştî Zerdeşt maye bê kes
Alî nake Hormiz bi hîç kes

1) C.P.B.; Hürmüzgan, M.; Hurmizgan 2) C.P.B.; raman, M.; riman 3) C.P.B. û M.; atiran
4) C.P.B.; wîşan, M.; wêşan 5) C.P.B.; şard we, M.; şardewe 6) C.P.B. û M.; gewregewrekan, lê R.Y.; gewrey gewrekan 7) C.P.B.; zorkerê, M.; zorkarî 8) C.P.B.; erebe 9) C.P.B. û M.; kurdîne
10) C.P.B.; xapur 11) C.P.B.; gînay, M.; gînay
12) C.P.B.; palê, M.; paley 13) C.P.B. û M.; heta
14) C.P.B.; Şarezor 15) C.P.B.; şîn, M.; şîn

16) C.P.B.; kenikan 17) C.P.B. û M.; beşîna
18) C.P.B.; merde 19) C.P.B.; tefî, M.; tîlî
20) C.P.B.; jî roy, lê R.Y.; we rûyî 21) C.P.B.; hewîna, M.; hiwîna, lê R.Y.; hûna 22) C.P.B.; rewîştê, M.; rewuştî 23) C.P.B. û M.; mawe
24) C.P.B. û M.; bê kes 25) C.P.B. û M.; bezîka
26) C.P.B.; nîka, M.; niyka 27) C.P.B.; Hürmüz, M.; Hurmiz 28) C.P.B.; we hîç kes, M.; we hiwîç kes, lê R.Y.; we hîç kes

20- Mukriyanî, Gîw, Gîwname, lapere 20-21, Hewlêr 2572/1960

21- Nebez, Jemal, Her dîsan di afirandina jorîn ya hejmar 11- an de. Rûpel 111

22- Zarî Kirmancî, Xêwî w Mudîrî: Seyîd Husên Mukriyanî, Tarîxî Damezrandinê 12 ZilQaîde 1244, Jimare 21, Salî çîwarem, Yekşeme 8 Zil-Qaîde 1348 (6 Nîsan 1930), lapere 19

23- Mackenzie, D.N., Pseudoprotokurtica, in : Bulliten of The School of Oriental and African

Studies - University of London - , Vol : xxvi (1963), Part : I, P. 170 - 173

24- Râşîd-i Yâsimî, Xulâm Rizâ, Her dîsan di afirandina jorîn ya hejmar 14- an de. Rûpel 119

25- C.P.B., Her dîsan di afirandina jorîn ya hejmar 4- an de. Rûpel 24

26- Mardoxî Kordestânî, Şeyx Mohammad, Her dîsan di afirandina jorîn ya hejmar 12- an de. Rûpel 50

" FELESTINEK HEBÛ
FELESTINEK DÎSA HEYE "

DENGBÊJÊN RIZGARIYA FELESTÎN

Rohat

Iro 2 milyon mirov, 2 milyon dil û 2 milyon can di rêda ne. Stara wan navbera erd û ezmane. Ew ji welatê xwe dûr li Lubnanê diminin, li Urdunê, li Suriyê an ji li welateki mayin diminin. Ew rojên xwe li çadirên spi, kon û xolikên piçûk da derbaz dikin. Lê, hêvi û bawerike wan heye, ew li bendewarê Felistineke rızgar mane. Niha em guh bidin helbestvanê dil bi kovan û dil bi keser
SAMIH EL KASIM:

Heta bihustek erd
Ji mira bimine
Dareke zeytunê bimine mira
Çel - kortek
Heta daristaneke piçuk bimine
Biranineke,
Pirtukxaneke piçuk
Suretên bapirên min
Heta diwarek bimine
Gili - gotinên ereban, stranên gel
Heta nıvısarên destan
Helbest bımının
Çirokên ANTAR AL ABSİ
Ev çav, ev pirtuk
Heta ev dest bimine
Yek ji ev bina mın...
Ezê bıqırım tekoşinê
Li ruyê vê dinyalîkê
Bı navên mirovên azad
Bıra têr bıbe, ev xınzırên sekbav
Bı nanê şermê va.
Ew dijminên ronahiyê
Heta deng ji mı derê
Wê bımıne bıra mın
Wê bıbe nan.
Çek - silah bina mın
Dı destê tekoşeran da.

Dı sala 1950' an da helbestvanê nav û deng -Humeyrad bı destê cellatan hat- darda kırım. Tu guneki wi tune bû, wi tenê ji welatê xwe pır hez dikır. Paşı dax-

waza avakırına "İsrayıla Mezin"ji sala 1948 an vırda zordestike gıran li ser gelê felestin pêk hat. Kevneperestên cihud çav berda-bûne welatê Kenan, bajarê Kudus û erdê felestin. Paşı Osmanı, ereb û İngilızan vê carê ji cihud ketibûne dorê. Vê zordestiyê Fatva Tukan dı helbesteki xwe da xweş diyar dıke:

Dema me
Mırın û bêbexti nas kır
Şunda vekışya avên behran
Dengê bajaran qels bû
Û deriyên ezmanan hatın girtın.

Helbestvan Tefik El Zeyyat ji ber vê rewşa dijwar û xırab gelek berxwe dıkeve. Lê ew serhıldanekê ji bı çavên xwe va dibine û dibêje:

Çıne ev hêsrên çavan ?
Çıye ev bayê ji rohilatê tê ?
Dı nav mirovên Çolê ketine
Dı nav wan da
Bı hesreta welat
Rabûye baki hışk
Çıye ev ba û bagera ?

Navê helbestvan Mahmut Derwiş iro li hemû cihanê xweş tê nas kırım. Wi bı şewat pır xet li duhev rêzkırine û xetên xwe bı jêhatike mezin va bı hev aniye. Heta niha çend berevokên Mahmut Derwiş hatine çap kırım, dı nav wan da ev navana hene:

- Pelên dara zeytûnê
- Berdılka mın Felestin
- Dawiya şevê
- Baraneke sıvık dı mehên payizeke dūr da
- Li celile teyr-tuyr dımırın

Wi gelek helbestên xwe dı

bendixane û girtigehan da nıvısi.
Ew dı helbesteki xwe da dibêje:

Carke dın dibêjim
Carke dın
Navê mın heye li kutıkan da
Destpêka rûpelê pêşın da
Ez ji mirovan dilêş nabım
Erişı kesi nakım
Lê dema mın birçi bıhêlın
Mın rût - tazi bıhêlın
Ezê bıxwım goştê wan
Bı ne pijyayi
Goştê wan hurç - guran.
Mêze bıke li vê birçibûna mın
Û hêrs - rıka mın.
Neguvışe damara mın
Û mın ji rê dernexe

Wusan ji bırayê Mahmut Derwiş yê heri piçûktır Remzi Derwiş helbestan dınvıse. Ew niha li İspanyayê dımıne. Remzi Derwiş ji hev xweştir pır helbest nıvısi, yek ji wan helbestê bı navê "Hertım bı hevra" ye.

Emê bımının bı hevra
Dı nav hevda
Ez û erdê mın
Rojên mırın û jıynê da
Emê bımının dı nav hevda
Heta roja meşerê.

Felestin iro bûye klam - stranek. bûye çek - silahek û bûye gula suretê mırıyan - şehidan. Bûye bin, baweri û hêvik, bûye destmalek ji bo jin zarokên felestin pê hesrên çavên xwe paqj bıkın. Bı taybeti rojên azad, delal û rojên dılşahiye ji bo helbestvanên felestin bûye armanceke mezin.

Ibrahim Tukan bırayê FATVA TUKAN dı helbesteki xwe da hatına van rojan diyari me dıke:

dumahık li rupela 22'yan e

TÊKILIYA

ZARAVAYAN II

Malmisanij

HEWRAMANI Û ZAZAKI:

Zaravaya Gorani (1) miyan dı Hewramani yew cawo muhim gêno. Qıse kerdışê mintıqa Hewramani (Kurdistanê İran û İraqi dı) ra Hewramani (Ewramani) vajiyêno. Hewraman bı xwı dı qısmi yo:

A - HEWRAMANI LUHON: Mintıqa Pawe, Notşeh, Nawsuda û Jawerû (dewanê: Paygelan, Bisaran, Rezaw, Kerava, Palıngan) dı.

B - HEWRAMANI TEXT: Dewanê: Dızlı, Dereki, Silin, Bilber, Jıwar û Niwindi dı.

Kurdistanê İraqi dı zi mintıqa Tewêle, Bıyare û Xormal dı Hewramani qısey beno. Ma cêr dı têkiley û pê mendışê zaravayanê Zazaki û Hewramani sero vındenim. Qısey Hewramaniyê cêrêni, hina vişi ey şaristanê Pawe yê. Ma fekdê yew embazê Paweyiji ra nê qısey Hewramanki gırewtim.

BEDELIYAYIŞÊ ME 'NA :

Mıyanê (beynatey) Hewramani û Zazaki dı yew yew qısa (kelime) ma'na xwı bedelnena. Ma vajim:

		KURMANCI		
darey	:	Hewramani dı yena	ma'na :	das
		Zazaki dı yena	ma'na:	dasa dar
zinc	:	Hewramani dı yena	ma'na :	çen-ge
		Za zaki dı yena	ma'na :	poz
çemçe	:	Hewramani dı yena	ma'na :	kevçi
		Zazaki dı yena	ma'na :	çoçık
kevçi-k	:	Hewramani dı yena	ma'na :	çoçık
		Zazaki dı yena	ma'na :	kevçi

CA BEDELNAYIŞÊ TİP (HERF) AN:

Tay tipi cay xwı bedelneni

HEWRAMANI	ZAZAKI
nerm	nemr, nerm
werwe, verwe	vewre, vewr-ı
zuxal	xızal
goçan	çogan

VIŞEY Û KEMEYA VENGAN:

Yew yew qısa, Hewramani dı hina vişi ya, yan zi hina kemi ya:

HEWRAMANI	ZAZAKI
ber	teber
hejge	heşe, heş-ı
roxane	ro
werçemteng	çimteng
gıleniye	gılli
hengam	gam-ı
rocyar	roc, roj
wêrege	êre, yêre

lacang
teylı
cinegi
tey

VİN BIYAYIŞÊ VENGAN:

Mıyanê Hewramani û Zazaki dı tay tip(herf) i estê kî vini benê, kewenê, tipê kewtey nê yi:

A-KEWTIŞÊ TİPANÊ DENG DAR(VOKAL) AN:

	HEWRAMANI	ZAZAKI
1) e,ê - *	: ebro-y (*riş eda(edza) emin kaye goşte mûye doşeke awr(*) here	brew eriş, erdiş (*da-y (*mın kay(* goşt(* muy(* doşek(* awre, awrı her(*
2) i - *	: simeri awi wari	simer(* aw(* war(*

B-KEWTIŞÊ VENGANÊ BÊDENG (KONSONANT) AN :

1) d - *	: ê(*r dêr	adır (*erey, berey
----------	---------------	-----------------------

		hen(*)i	hendi,hindi
		çen(*)	çend,çınd
		diz(*)i	dızdı,duzdey
2) h	- *	: hesere	(*)estori
		hardi	(*)ardi
		hê çkuçi	(*)eşkiji,
			(*)eskici
		hawrişe	(*)awrêş
			(*)arbêş
		hamın	(*)amınan,
			(*)amno-n
		(*)êvring	hevring
		heloç	(*)alınç
		hê zım	(*)izım-ı
		lê(*)f	leheyf
		hemir	(*)mir
3) f	- *	: şıft	şı(*)t
4) k	- *	: barık	barı(*)
		were(*)	verek
		qji(*)	gjik,gıcık
5) l	- *	: lê la	(*)ela,(*)ella
6) n	- *	: jer(*)eji	zerenc-ı
		ter(*)	tern
		dı(*)dan(dılan)	dından,
			(dildo-n)
7) st	-(s)*	: derzi(*)	derzin
		: hes(*)ere	estor-ı
		mas(*)	mas
		was(*)ey	waştış,
			wastene
		hes(*)	hest
		wıs(*)ey	vıstış
		engus(*)	engışte
		wester	weş(*)êr
		hes(*)ure	vıstowre
		zıms(*)an	zimıstan
		ras(*)	rast,raşt
8) w	- *	: masaw-i	masa(*).
			mase(*)
		paywe	pay(*)a,pay ra
		ê(*)r	ewro
		dimaw	dima(*)
		goşware	goş(*)are
		ewra,owra	a(*)ra
		gaw	ga(*)
		wılaw kerdey	vıla(*)
			kerdiş
		awa kerdey	a(*)kerdiş
		hawrişe	a(*)rûş
9) xw	- *w	: (*)we	xwe,xwı,xwu
10) y	- *	: keywanû	ke(*)wani,
			ke(*)bani
		ê(*)r	eyro,êro
		gyan	g(*)an

BEDELIYAYIŞÊ VENGAN:

A -Bedeliyayişê tipanê dengdaran:

1) e	- ı	: gızı	gezi
		şewe	şewı,şew-e
		bırmey	bermayış
		inde	endi
		wırde	wırdı
		çem	çım
		beye	beyı
		bize	bızı
		wule	welı
		şış	şeş
2) e	- a	: ane	eynı
		zema	zama
		ewra	ara
3) ê	- ey(u)	: perê	perey
		têj	tuj
4) u(û)	- ı(i)	: şut	şıt
		dıtey	dıtış,dotış
		şitey	şıtış
		tufeng	tıfıng
		engus	engışt
		heçkuçi	eşkiji
		wutey	wıtış
		keywanû	kewanı,
			kebanı
5) o u	- e,a	: nuwe	newe
		maç kerdey	muçi kerdış
		pore	piro,purı
		çom	çem
		owra bıyay	ara bıyayiş
		seroçêr	seracêr
6) uwe	- ı,o	: nuweştey	nıstış
		guwen	gon-i

B -Bedeliyayişê tipanê dengdaran:

I - Xwı mıyan dı tadiyayişê tipanê C,Ç,G,J,S,Ş,Z:

1) ç	- c	: çır,çêr	cır,cêr
		roçın	locın
		seroçêr	seracêr
		waçi	vaci,waci
		çiçe	çiçe,çije
2) g	- c	: gım kerdey	çım kerdış
		gım bıyay	çım bıyayiş
3) j	- c	: jeni	çeni
		jeneke	çenê ke
4) ç	- j	: heçkuçi	eşkiji
		rocyar	roj
		çiçe	çije
		roçe	roje
5) ç	- s	: çun,	se,seno
		çeniyen i?	senyen i?
			senin i?
6) ç	- ş	: heçkuçi	eşkiji
7) j	- ş	: ejnewey	eşnawıtış
		hejge	heşı
		heşpişe	eşpiş-ı

ŞAŞIYEKE HEJMARA HEFTAN

Di helbesta Rojen Barnas, " Rojbaş Roza! " de, rêza duduyan ya benda şeşan bî çewti weha hatrye nwisandin :

"Kulîlk di guliyê xwe de xweştir e"
Dwêt weha bîhata nwisandin:

"Kulîlk di guliyê xwe de geştir e "
BERBANG

AMEDA MIN

Ameda min
Mefera min a dahatû
Di tevgera şoreşê de
Sersed a min

Zil de,
Hêşîn ke mefera min

Xweziya min li te tov
Xwîna min li te baran

Ciran,
Her çî qas ker û lal bin jî
— Bo kêrhayên xwe —
Tu adan î
Tu serxwirê dijîmîn
Tu nimaya serxwebûna niştîman î
Û jîndewariya me.

Rojen BARNAS

TEERÎB

Le asmanawa ne hatûm
Mîn miwan nim
Mîn miwani
Sê ber-qursi Kurdustan nîm
Ber le mê jû
Kaniyek bûm lêre derbûm
Ber le mê jû
Agrêk bûm lêre hel bûm

Barken biron !
Kanyawekan cige le mîn
Kesêki tîr têraw nakîn
Darguwezekan cige le mîn
Bo hîç kesêk
Sêberî xoyan helnaxen

Barken biron !
Zewî ê me
Dani ê wey lê şîn nabe
Mêrgî ê me
Lê jêr pê y garanekantan we agrîn
Ta dartûşman yaxi debîn
Colaneyek bo mînalîtan ranagrîn

Barken biron !
Miwey dîrextekanman kal e
Awman swêr e
Hengwinman bedemtan tal e
Barken biron
Barken biron...!

Abdullah PEŞÊW

HERIN!

Herin, herin!
Zûka veşerin
Destên xwe jî min bîkşînin
Ji min bigerin
Herin!

Mîn ev bexçe
Ne jî bo we gul tê de çandîne
Mîn ev malok
Ne jî bo we lêkirine
Mîn ev derbend
Ne jî bo we ava kirine
Mîn ev rê û borî
Ne jî bo we raxistine
Diya min
Ne jî bo we ez anî me dinê
Ev gol û çem jî
Ne yên we ne
Lê hûn çî sekîni ne?
Herin!..

Firat CEWERÎ

WELATÊ DÛR Î ŞÊRÎN


Çî bîkîm iro tu bîndest î
Te hewar û gazi
160 salî em bê te jin
Jî dubendî em bûn xwecî lî Rom
Navê me bû Gawestî
Bî tenê man lî deşta Rom.
Hemî malbatê Kurdan,
derbeder bûn kom bî kom.

Welatê çîyan, çîyayên muqaddes
Kalîkê mîn qal dîkîr
Bî navê Cîzira Botan û Mem û Zîn
Kalîk bî axin çû ser rehma Yezdan
Bî kovana stran û kîlaman

Dema ku çêbû yekîti û yek raman
Em ê jî nû ve vejînin Memê Alan
Belê bê Cehş û bê Ewan..
Lê markî bûka zeri, Zîna Zeydan
Û ala rengî deynîn
Bîla berba be lî ser bîrca belek
Ew çax em ê avakîn
Kurdîstanekî gewre û pak

Mervan ÇEKALÎ

JÎ NAV RÛPELÊN KOVARA HAWARÊ



KURD Û KURDISTAN BÎ ÇAVÊN BIYANIYAN

Cigerxwîn

ME JÎ JORDE TIXÛBÊN WELATÊN KURDAN GOTÎ-
BÛN, WELATÊ WAN LI BAKURÊ JÎ CÎHÊN BİLIND KO
BÎ DARÊN: MAZÎ Û BERIWAN HAWÎR GÎRTÎNE,
DESTPÊKIKÎ Û HÎN BÎ HÎN BER NÎVRODE NÎZÎM DÎBÎ.
Û DÎGHÊ ÇOLÊ. Û LI SERÊ ÇIYAYÊN WAN YÊN BÎ-
LÎND Û BÎ BERF KANÎ DERDÎBÎN Û ÇEM Û ROBARÊN
MEZÎN JÎ WAN KANIYAN DER DÎKEVÎN Û XWE BER-
JÊR BER DÎDÎN NAV DÎLÊ PENGAVÊN MEZÎN Û BER
BERE DÎGHÊN MEDREBÊN BÎRÎNCÊ, KO JÎ QÛNTA-
RÊN ÇIYA BER BÎ DEŞTÊVE DÎRÊJ DÎBÎN, DÎ CÎHÊN
BİLIND DE ÇANDÎNÎ KÊME, JÎBER KO GAVA DÎ
DEŞTÊN BÊ DAR Û BEJVE, ROJ HEMÎ NÎVŞÛN: ZAD
Û ÇANDÎNÎ PÊ ŞÎN DÎKÎ.

Serên çiyên hêj di bin ber-
fê dene, li gundên kurdistanê
bergehekî pir sipehî heye, ga-
va mirov nêzikî wan dibî reng
reng darên guwîjan xwe ni-
şanê mirov didin û dibin siya
wande xanî hatine veşartin.

Û ji rexên dinve hawîr ka-
niyan û keviyên robaran bi
sipîndaran hatine xemilandin,
çawa ko di tu gundîde av ne
bi kêmasiyê, ji xwe ev sipî-
ndarên ha di lêkirina xaniyên
kurdande binyadeke bingehî-
ne, ev dar tê avin û bi germa

rojeke geş di çaxekî hidik de
gelek dirêjdibin, ko mirov
newêrî li wan binerî ji tîrsa,
wê kumê mirov bikevî û geh
katên ceh û genim di rex hev-
de bihimbiz bedenên wan bi-
lind dibin û gelek zirav û ras-
tin û weke neya nav avê bi
rewş û pergale xweşiktêne xu-
yakirin û li gora evaniya wê
hindamê nizim û bilind li ha-
wir wan. Rez û darên zeytûna
û bostan û zeviyên: Ceh û ge-
nim tene xuyakirin.

Lê di gunden kurdistanê de
mîrov gundekî nabênî, ko

(minarak) bi ser gund dikevî.
Û di milkê wande carnan bir-
ceke çar parsu - bilind tê xu-
yakirin, belkîjî xanî hemî di
çaxekîde wilo hatibin lêkirin,
ko di rojên ceng û şerande bi
kêrî wan bèn û ji wanre bibin:
şargeh û kozik û çeper.

Her wekû di hindirwên xa-
niyên kurdistanê de ji aliyê
malê pêve odake di heye ko
mezin û cihê mêvanaye û di
hundirwê wê oda mezinde ti-
fikek heye û li herdu rexên ti-
fikê du dikên bilind û raxistî
hene ko mêvan liser wan rû-
dinin û çend palgeh ji liser
wan dikane.

Û di malên mezinde bi ma-
furan xemilandîne û xalîçan
radixin û ji ber kurd misilma-
nin û tu car xwedê jibîr nakin
û li şûna ko herin mizgevtê
nimêj bikin, dikarin liser van
xalîçan nimêja xwe bikin.

Û yekjî ewe ko Marşal (la-
mî) xaniyên kexwe û serokên
Eşîran dîtine ko bi xeml û
xêzin, çawa ko em dizanin

xaniyên gundan di nav hev-
dene û kolanên wan gelek
teng û ne zif kirîne û ev riyên
wan ji bona siwarên rê nenas
gelek dijwar û bitirsîn û bi
hezar dijwarî û bi zor hêstir di
wan kolanave derbasbin.

Heta vir me ji kovara
HAWARÊ guhaztiye û gelek
diruste ko kême û zêde tede
hatibin ji ber ko gelek hûr li
Ewropa çapkirine. Lê ji vir û
hade ez ji nik xwe bi serve
zêde dikim:

Weke ko tê xuyakirin xwe-
diyê nivisarê baş li kurdistanê
ne geriyaye û tenê hin xani-
yên gunden kevnare ditine ?

Jiber ko hin xaniyên gelek
xweş di gelek hindamên kur-
distanêde peyda dibin û gelek
ji wan koçk û qesrên mezin û
bilindin tevli ko neweke ava-
hiyên Ewropa ji, lê ji xani-
yên Tirk û Ereb û Eceman ne
kêmtirin.

Ez carekê di nav (berwar-
yave)hatim(Cizêrê) û min ge-
lek xaniyên qesr û bilind û ji
dervede sipî û gelek bi rist û
destûr hatibûn avakirin û he-
mîji di nav bax û bûstande

bûn û rê û kolanên bajarên nûjen dihatin xuyakirin..

Lê ez bixwe çûm hindurwên wan, ji lewra ez nikarim pesnê hundirwên wan bidim. Tenê ne hemî kurd tenê belkî ji hemî xelkên kurdistanê mirov dikarî bikî du perçe::

1 -Malên mezin û dolemend û xanedan.

2-Û yekjî, malên gundiyan belengaz û reben.

Bêgomane, ko rewşa hundirwê malên (belengaz û reben)ne weke hundirwên (malên mezin û dolemendin, her wekû tiştêkî dijî hebû ko di havînande eger ne jibo mêvane-kîbî gundî hundirwên xwe ranaxin, lê zivistanan xaniyên tevan raxistîne, tenê raxistina malên mezin û xanedaran bê goman ne weke xaniyên malên belengazin.

Raste di hundirwên xanedan û malmezînan û dewletmendandê xaliçe û tejberên rengîn û giranbiha têne danin û di hundirwên belengaz û rebenandê merşikên hirî û mû jiber sermayê radixin û gelek caran esîran jî dibin merşikandê datinin.

Lê çiman belengaz nikarin weke xanedan û dolemendan di hundirwên xwede xaliça û tejberan deynin? jiber ko carek Axa û xanedan nahêlin û di xeyidin, ko kurmancek xwe wek xanedana bidî nîşandan, û carekî jî tirsê Talan û şewata ko: Beg û axa û malmezînan biser gundiyan debarandin, lê di awira minde, jiber ko divan çend salên paşîde ko talan û şewitandin kêm bûne, îdî belengaz jî weke berê nemanê û herkesî hundirwê xaniyên xwe li gora rewş û pergala xwe radixî.

Yanji xwediyê nivîsarê di çaxekî gelek kevnarede li Kurdistanê geriyaye ko li malên Axa bûye mêvan û xaniyên malên belengaz û reben nedîtine.

Ca, weke koez geriyame û li malên xanedan û belengazan tevan rûniştîne û bûme mêvanê xanedan û gundiyan belengazjî, û li gora dîtin min kurd yan xelkên Kurdistanê di çend qûnaxanve derbasbûne :

Di qûnaxa pêşîde Axayê eşîrê ko ji alîve jiber mêrekîve serdarê eşîra xwebo û ji alîkî dîveji serkarê mîre hindamekê bû û jêre bêş û salyanên gund-

diyan di çivand û ji mîrê xwêre dibir. Û di rojên şer û cengandê serdarê eşîra xwe bû û di bin siya ala mîrê xwede siwar û peyayên xwe dikşandin meydana cenga dijminan, û bêgomane ko mîrê mezin têra mêvanên wîjî ji wan : bêş û saliyan didayê, û gelek caran wîjî hin bêş û saliyan, yan weke, ko kurd dibêjin : bêş û bela tavên ser êl û gundên eşîra xwe, ko karibî mêvanên wanjî xwedî bikî. Û liser vê destûrê Axayê mezin li çar qozîyên oda mêvana hin kevîr yanjî kelpîç bilind dikirin, ko nîşana navdarîbû û mêvanan jî dûrve xwe li oda Axê digirtin.

Lê di qûnaxa diwemde, ko mîrek nemabûn weha dewletê pere didane Axa, Axayê mezin bêş û bela bîzor çonte tavên ser gundî û koçeran.

Jibo xwarina mêvanan çend çewal genim ji her malekê gundî disitandin û jibona xwedîkirina sewalên mêvanan çend çewal ceh hi yekî gundî distandin û wekî dijî heçî jinek ji kurê xwêre banya beşa Axê ser qelendbû, û heçî ziyaneke mezin bikra Axê ew talandikir û beşeke mezin jê distand û bivî rengî mêvanên gundiyanjî xwedî dikirin. Lê weke, ko tê xuyakirin ev qûnax gelek dirêj nebûye, û kurd ketine qûnaxêke di...

Di qûnaxa sîkyemde Axa bi saya serê begler û efendiyên bajarên mezin xwe bi zor çonte xwedî dikir, Axayê nezan nîve gund yanjî seyêk didane efendîkî, yan çebebîkî-malmezînekî bajarî û wî efendî... Ew ji zor û sitema jandirmên dewletê di parastin û Axa tenê weke serkarê çebebî û mal mezinan bûn, û havînan benderên gundiyan di pîvan jî çebebîrê dixistin enbaran, yanjî çalan û kengî çebebî bixwesta dihat ew enbar û çal vedikirin û dexla xwe difrot û pêre ji xwêre dibirin, û gelek caran para Axêjî jêre dihişt.

Lê dinav herdû qûnaxên dawide Axayê navdar gelek ji comerdiya xwe kêm kiribûn û hew mêvanên gundiyan xwedî dikirin.

Lê di qûnaxa çarande bi çawîş û mûdir û jandirmare dibûn hevpar û bi hevra malên gelên xwe di dizîn û dixwarin. Gelek caran çawîşek dihatê gund, ko saliyan û beşên dewletê ji gundiyan bistênî û ji Axêre digot: "Eger jimîn tenêrebî, ezê serê

malê çil kaxetî ji wan bistênim, lê eger tuji dixwazî bibî hevparê min, ezê serê malê sed kaxetî bistênim."

Û pirên caran Axa dibûn hevparên dijmin û bivî rengî malên gundiyan xwe dixistin devê xwe û dijmin û bi hevra dibûn dizê malê Axê-malê eşîra Axê, lê Axayê nezan ev ji xwêre gernasîyek didî û sinbêlê xweji badidan û digot : "Ewê ko ne di fermana mindebî, ez bavê wî bi jandirma bişewitênim." Û gundiyan ji tirsan serê xwe jêre xwar dikirin û ji gotina wî dernediketin.

Çend çîrokên ko li nik min çêbûne dixwazim divirde bêjim :

Carekê çawîşekî jandirma hate gundê me û êvarê mudîr û çawîş û axa bihevra di odakêde rûniştin û navên zarûwên çend malên bi tewaş liser kaxezekê nivîsîn û dane destê çawîş û sipîde çawîş bi çend jandirmave ketin nav gundê hesarê û ev nav yekep yeka xwestin.

Ev serpehatî di cenga mezina cihanê ya pêşîde ko di sala 1914 destpêkiriye bûye, ma kî wêrî kurê xwe têxî nav lepên jandirma, û hemîjî dizanin : heçî herî şerê eniya rûsya, sax venagerî mala xwe. Û naçare digotin : Çawîş efendî kurê min ne li malê.

Çuye ku ? Biserê bavê te ez nizanîm çuye ku ? Lê çawîş bi xurtî digot : şildim, bildim nizanîm, wî bavêje orde! û xwîn xwerên jandirma li çi digerin ?

Bi hovîti bavê reben tavên erdê û herdû lingên wî dixistin qayîşa tivingê û berjor dikirin û çawîş efendî bi şîva xezetan ew reben hingiaftin. Û dibû hewar-hewara jinan û diçûn cem axên diz û dostê dijmin û dijminê gundiyan xwe... Ji jinên wanre digot : Lawo welleh ez nikarim we ji nav destê vî bê bavî bê pere derxim! Dê herin hin pere ji minre peyde bikin, ko bidim çawîş belkî karibim mîrê te berdim ?

Û jînik naçare di hate mala xwe û ji mirovên wîre gotina axê digot û naçare li hev digeriyan û hin pere : kêm-zêde ji axayê xwêre di civandin. Û didan destê axê û digotin : bi serê bavê gê me nikaribû jivan bêtir bidin hev. Û axê çawîş dibire alîkî û ew pere dixistin bêrika wî û digot : hema bela jiboxatirê mîbî hêvî dikim tê

vî mirovî berdî! U çawîş digo: de here! bila tu xatirê axê bî, heke na, minê bi dara tu bi kuştî û tiştê pir dijwar ev bû, ko : jin û mîrên gundiyanjî destên xwe ber bi ezmananve bilind dikirin û di gotin xwedêwe ! tu vi axayî ji serê me kêm nekî! de heme bi xwedê ne ji wîbûna wê bavê... bi şîva bikuştî ?

Wey reben gelê Kurdistan? dijminê xweyên herî mezin nasnedikirin. Û ji xwedê ji wanre jîneke drêj ji xwedê di xwestin, wey reben kurd! Û xelkên Kurdistanê !

Lê di qûnaxa pêncade û bi saya serê hin hêzên pêşverû gundî hinik şiyar kirin. Û hew çûne oda wî û hew karê wîjî kirin û hew beş û bela jî danî. Û di vê qûnaxêde biger gundî û axa bûne wek hev û Axan hew nan jî didane mêvanan.

Lê divê qûnaxa sêşemde li hin ciyan îdî hew nanê axa der dikevî û naçare dibin peyayên dijmin û çelawiziyê li gelê xwe- li gundiyan xwe dikin û bi hezar dijwarî çumakî pîsik ji destê dijmin distênin û xwe û zarokên xwe bi vê çêşmeriyê xwedî dikin.

Û hemî kurd di îrode mêvanên xwe xwedî dikin û bi ser oda axêde weke çaxên berê rastnakin. Ji ber, ko axa jî weka wan belengaz bûne û hew dikarin mêvanan xwedî bikin çawa ko hew dikarin Qulebazîyan li gundiyan xwejî bikin.

Lê ev destûra ko ez datînim li ser hemî axan ne duruste, ko mirov deynî- ji ber ko hê hemî wîlo belengaz nebûne. Û heta îro jî nanê mêvanan didin, û hin jî xwe welatperwer dibînin meger çendan bîr û baweriya wanjî ne weke bîr û baweriya Kurdên pêşverûne, lê em nikarin ji wanre bêjin : ne welat perwerin. Ji ber, ko welat perwerî jî ne weke heve :

1- Welat perwerî bi rast û ronî heye, ko bi mal û canê xwe dikarî fidakarî bikî.


2- Welat perweriyek jî heye, ko li ser derewa xwe mezin dikî û di çavên nezanandê xwe dikî welat perwer.

Û di dilê xwede ji dijminê kurd bêtir dijminê kurdê, lê hingî jî tê dixwazî di bin perda welat perweriyêde veşêrin, lê gelek ji wan nikarin nikarin xwe veşêrin û nayên veşartin.

XACERÉZ

ÇEPERAST

- 1- Dı dirokê de navê Wanê. - Bı erebi tewrek çûk (çivik) ku dı Kuranê de lı ser van çivikan aye-tek heye.
- 2- Dı kurdi de prepozisyonêk (berepaş). - Terbiye.
- 3- Şaireki bı nav û deng (ji Emerika Latini).
- 4- Prepozisyonêk. - Bûyerek xuzayi (berepaş). - Dı Kimyayê de kurte nivisa sodyumê.
- 5- Ne tûj. - Kurte nivisa manga-nezê (berepaş). - Dı muzikê de noteyek (berepaş).
- 6- Şaireki Latin Emerikayi. - Navêk Erebi.
- 7- Birê pivazê. - Ben, dezi. - Nidayek (berepaş).
- 8- Mezer, Qebr. - Pê cil tê dirûtin (berepaş).



- 9- Dindar, Kesên din diparêzın.
- 10- Bı zaravayê Sorani heyf, intiqam. Lı hnek hereman ji êzdiyan re dibêjin (berepaş).

SEREJÊR

- 1- Ressamek bı nav û deng.
- 2- Kurte nivisa navê Emerika. -

- Ne do û ne sibê (berepaş). - Kurte nivisa Litrê.
- 3- Kurte nivisa Bulgariya. - Lı hnek ciyan ji agir re dibêjin. - Lı dinê deşta heri mezin.
- 4- Lawrêk ji familya şêr û şepal e. - Xelk millet.
- 5- Axaftina telefonê. - Dı nav Kurdan de ji traktorê re dibêjin.
- 6- Bı hnek zimanê n Ewrûpayi na. - Mêrê miyê (berepaş).
- 8)-Tolazi,terali.
- 9- Xwediyê dinê bûdizmê. - Bı farisi roj.
- 10- Pis, zışt, lewiti, nepak. - Keseki mêrê wê an juna wi miribe.
- 11- Şaireki bı nav û deng, ku ew bı xwe kurde û ji bajarê Ruhayê ye; lê dı dewra Osmaniyande ji padişahan re nivisiye.
- 12- Bı zaravayê dımili vekırın.

DUMAHİKA RÛPELA 16 'AN
(Jı nivisa ROHAT)

Lê binêre
Deng û behsên rızgariyê
Lı derê we dixê
Bina cejnên bı gul - guli
Lı ser pozê me digere
Daxwazeke me hemûyan heye
Perçeki welatê meyi piçuk
Dı destên me da maye
Xwe şıdyayi bıgrın
Çawa hemû dızın bıgrın
Bıra nebın wi ji.

Helbestvan Abu Salma ji vê baweriyê bı tehreki dın dınivise:

Emê vegerın
Heye, stareke me
Wek çavên xwe dızanım

Neweste ! dilo, dilo !
Emê vegerın
Bıra per - biskê te neweşê
Emê disa vegerın.

Mırov dıkare dı hemû helbestên felestin de binfrehi, bawermendi, rûkeni û beşereke xweş bıbine. Vê carê Salim JABRAN deng dıke:


Dema mın mızginiya serketinê girt
Mın belav kır cıxare
Dan girtıyan, dudu - dudu
Bı dengêki bılınd
Stranên mêraniyê mın got
Qırfe xwe, tınarê xwe mı kır
Bı qeyd - zınciran
Bı gardıyanan va.

Pır helbestvanên felestin iro pêra gihiştine û pênusên xwe kırine şûr dınivisin, wek Abu Salma, Reşit Huseyin, Mahmut Sobn, Feyaz İd, Muis Besiso, Ahmed Dahbur. Bı rasti dema mırov helbestên felestin dıxwine mırov têr dibe û kela dilê wi bılınd dibe.

M. Lewendi

BERSIVA HEJMARA 7 'AN





BERBANG
TUNNELGATAN. 14, 3 tr.
111 37 STOCKHOLM

MASSKORSBAND



PROGRAM

FOLKDANSER * FOLKMUSIK * KÖR * POESI * TEATER * GÄSTARTISTER
FOLKLOR * STRAN * KORO * HELBEST * ŞANOGERİ * ARTISTÊN MÊVAN

PLATS-CIH: ÅSÖ GYMNASIUM ① SKANSTULL
TID-KAT: 19.3.1983 KL.18.30 INTRÄDE: 15:-

KURDISKA RIKSFÖRBUNDET